

**liser şêweyên vaksîne kirina dij bi guhreqî, duşaxe, xeneqîtik, Înfluenza Haemofilûs tîpa b, feleca zarrokan û zerika B**

Bi giştî vaksîne kirina dij guhreqî, duşaxe, xeneqîtik, Înfluenza Haemofilûs tîpa b, feleca zarrokan û zerika B di maweya şîr dan û destpêka zarokatîyê tê pêşniyar kirin.

Heta bijarên dermanî jî nikarin hertim berî ji kursên bi pirranî kûjer û bandorên demdirêj ku gengaze ev nexweşîya çirkîn liser kesê bê vaksîne hebe, bigire. Tenê vaksena pêkhatî ligor bernameyê dikare kesekî lihember wan biparêze.

Meniqeke kû vekseneka têkel bo parastina li hember ev şeş nexweşîyane bê bikar anîn: Rêjeya derzîyê pêwîst bo parastin lihember nexweşîya kêmtir dibe û bernameya passporta vaksînekirinê zelaltir dibe û rihettir tê şopandin. Vaksena têkel ya izindar di Elmanê da herwek vaksenên cûda, bêmetirsî û bibandorin.

**Lockjaw** (guhreqî) nexweşîyek zerav e kû jîyanê dêxe ber metirsîyê. Ev bakterî ye bi pirranî di nava toz û xubar û axa rêyê da peyda dibe û bi rêya birîn, şeşbûn, qepişîn, yan geztin û heya ji birînek pir biçûk da dikevîna nava leş û jehra guhreqî kû berpîrsê ev nexweşîyê ye, çê dike. Girtina masûlkeyan yek ji nîşaneyên nexweşîyê gelek cidî ye û dema masûlkeyên bîn kêşanê bêxe ber bandora xwe dibe sedema xendiqînê. Tevî şêweyên dermanî yê nû, zêdetirî ji 10 heya 20 ji sedî ji nexweşên tûşî guhreqîyê dimirin.

**Diphtheria** (Duşaxe) nexweşîyek zerav a metirsîxera ser jîyanê ye ku ji jehra bakterîya duşaxe çê dibe û bi pirranî bi rêya dilopê zeravê di hewa da tê veguhestin. Berî kû vaksîne kirin derkeve, gelek zarrok ji zerava duşaxe yê kû xwe bi şikilê bîrîna gevîyê, xûrxûrîşkê û pozê nîşan dida, dimirin yan endama dilê wan tûşî zirarê dibû. Rêjeya beşdarbûn di vaksîne kirinê da bûye sebeb kû duşaxe bi xênjî çend mijarên taybet di Elmanîyayê da têk biçê. Lê belê ji ber ku hê di asata gerdonê da berdewame- bi taybet di hinek ji welatên Ewrûpaya rojhelat da- gengaze metirsîya tûşîbûna dubare ji vê û zerava dubare li maweya geştê da hebe.

**Whooping cough** (xeneqîtik) bi giştî bi rewşa sirlêdanê destpê dike. Ev nexweşîye dibe kûxikê bi şidet û bi pirranî dibe sedema bêtengavî û verêşanê. Di 6 mehên destpêkî yê jîyanê da, gengaze kûxik wek nîşaneyê taybetî tune be û lê di şûnê da, metirsîya bêtengavîyê hebe; ji ber vê zedav bi taybet di sala yekim ya jîyanê da pir metirsîdare. Rêjeya derketina bandorê balkeş di temenê zarroketîyê da pir bilinde; bi taybet gengaze zatûrriye, zerava guhê navendî û zirara berdewam da mêjî da pêk bê.

Nexweşîyê bi sedema bakterîya **Înfluenza Haemofilûs tîpa b** (Hib) yek ji nexweşîyên zeravî yê balekeş di temenê şîrxwarinê da ye. Mejûtevn û werema demaxa vehevandî kû hefik û dergêha gevîyê liber digire û dibe sedema xendiqînê, pir metirsî dare. Ev nexweşîye bi pirranî di temenê 5 mehî heya 3 salî da derdikeve; paş temenê 5 salî yê ev nexweşîye gelek kême.

**Feleca zarokan** (poliomyelitis) nexweşîyeka vîrûsî ye ku dikare bibe sebeb felecîya dest û pê, heya felecîya bînê û di encamê da bibe sebeb xendiqînê. Gelek nexweşê tûşî felecîyê ji zirarê demdirêj zecrê dikişînin. Ji sala 1998, vaksena feleca zarokan êdî bi rewşa vaksena devî nayê dayîn belkî ev vaksene pêk tê ji vîrûsa feleca zarokan ya mirî (vaksena bêçallak). Êdî feleca zarokan di Ewrûpa da tune. Lê belê, metirsîya tûşî bûn ji zerdavê bi sedema pêwendîya gel nexweşekê û li maweya geşta heremê ku feleca zarokan livir belav

e û bitaybet Asya û Efirîqa, heye. Ji ber vê dibe vaksena feleca zarrokan heya îro rojê jî bi berdewamî bê encam dan.

**Zerika B** perciwîna vîrûsa kezebê ye. Gengaze gel nîşaneyên wek sirlêdan, verêşan yan êşa zendan destpê bike û paşê bibe sebaba zerbûnê. Herwisa gengaze zerdava birewşa nehînî bidome. Nêzî 1% ji nexweşa diminrin. Zerdav di 10% nexweşan da berdewam dibe; vîrûs di leşî da dimîne û dikare bibe sedema zirrare balkeş ji kezebê (cergmûmî, penceşêr). Kûrsa berdewamiya nexweşiyê di kesê kû di zaroketiyê yan biçûkatiyê ji aliyê dayîk yan ji aliyê kesên dî bi rêya pêwendîya nêzîk tûşî bûne, gelek didome (di rêzê da nêzî 30 yan 90%,). Di Elmanê da, nêzî 0.5% ji xelkê bi berdewamî tûşî vîrûsa zerika B ne. Veguestin vê bi rêya xwînê yan şêlava leşa kesê tûşî û herwisa nêzîk bûna cinsî pêk tê.

### Vaksen

Vaksena têkela 6 carî ji beşên jêr pêk tê: Jehriya bê jehrbûyî ya duşaxe û pathogenên guhreqî, beşek ji bakteriyê hatî kûştin yê xeneqîtik (vaksena xeneqîtik bê şane) û beşên ji pûşişa piroteîna bakteriya Înfluenza Haemofilûsa tîpa b (vaksena pêkve girêdayî ya Hib), polivîrûsa bêçalak û beşên ji pûşişa piroteîna vîrûsa zerika B kû pê bikaranîna teknolojiyê di şaneyê hevîrtirş tê berhev kirin. Ev vaksene ji masûlkeyê tê lêxistin (derziya masûlke). Bijîşkê ve dikare agahiyên taybet bi destpêkê û maweya kûrsa parastina vaksenê daynê ber destê we.

### Kê û çi demekê dibe bê vaksîne kirin?

Passporta vaksîne kirinê, vaksîne kirina têkel dijî guhreqiyê, duşaxe, xeneqîtik, Înfluenza Haemofilûs tîpa b, feleca zarrokan û zerika B ji bo giş zarrokan û ji temenê 8 mehî paşê tê pêşniyar kirin. Vaksîne kirin dibe di destpêka şîrxwarinê ankû di temenê 2, 3 û 4 mehî da destpê bike û paşê vaksîne kirina bihêzker di 11-14 mehîyê da destpê bike. Giş dozên navbirî dibe di maweya pêşniyar bûyî da bê lêxistin. Hişyarî: dibe vaksîne kirinê bihêz bo guhreqî, duşaxe, xeneqîtikê û feleca zarrokan dibe di temenê dibistanê û maweya baliqî yê da û ligor pêşniyarên STIKO pêk bê.

### Nabe kê bê vaksîne kirin?

Her kesê kû tûşî nexweşiyê bişidet pê germahiyê (bilintir ji 38.5°C) bibe kû pêwistî bi derman heye nabe bê vaksîne kirin. Eger ji her yek ji beşên vaksên re alerjiya zêde heye yan eger paş vaksîne kirina berê dij yek yan çend pathogenên heyî di vaksena têkel da nîşanên nexweşiyê derketin, bijîşkê vaksîneker liser gengaziya pêkanîna vaksîne kirinê tê ji dêbava re rabêja pêşkê biken. Ev mijare herwisa liser zarrokan pê nexweşiyê berdewam yan zarrokên kû bigûman nexweşiya berdewam hene, dirastî ne.

### Kiryarrên paş vaksîne kirinê

Kesê vaksîne kirî pêdivî bi çi parastina nîne; lê dibe heya 3 roja paş vaksîne kirinê ji stressê fîzîkî yê neasa dûr be. Eger zarrok xwedîmercin kû tûşî bertekên dilî û demarî bibin yan zelale kû bertekên alerjîk yê bilez hene, dibe bijîşkê pêş vaksîne kirinê agadarî ev kêşeyê bibe.

### Bandorên gengaz yê sivik û rizikî yê paş vaksîne kirinê

Paş vaksîne kirinê, gengaze zêdetir ji ewle bûna kêrhatî û parastina têkldar liser nexweşiya, sorbûn yan werimîna bi êş li cîyê derziyê derkeve. Ev mijare berteka asayîya leşiyê lihember vaksenê û bi pirraniî di navbera 1-3 rojan paş vaksîne kirinê derkeve holê lê gelek kê

didome. Hinek caran gengaze perdeyên lenfî yê kêlekê biwerimin. Hinek caran gengaze kû giştîya endamekê (pê yan dest) biwerimê. Bi giştî gengaze saxlemîya 1-3 rojên destpêkî bikeve ber bandorê kû gengaze pêk bê ji bilindbûna germahîya leşî, nîşanîyên wekî înfîlûenzayê (hejan, serêş, êşa endaman, wesatn), yan kûxîn, bêhêminî, bihestyarîbûn û girînê na asa, be. Herwisa, gengaze ji destdana eqaqeya xwarinê, dilrabûn, verêşan yal dilçûnê biqewime. Tagerma 39°C û bilintir diqewime. Bandorên navbirî bi giştî demekî ne û bi lez û bê bandorên demdirêj kêmtir dibin.

### **Gelo gengazîya derketina bandorên kêlekî bi sedema vaksîne kirinê heye?**

Derketina bandorên kêlekî bi sedema vaksîne kirinê zêdetir ji asata normala berteka dij bi vaksenê kû bandora nerênî ya balkeş liser saxlemîya kesê vaksîne kirî hebe, gelek kême. Di hinek mijarên taybet da, gengaze zarrok paş vaksîne kirina pê vaksenê 6 carî, tagerm bê wan kû bi giştî bê bandorên demdirêj kêmtir dibin. Gengazîya bertekên alerjî ji vaksenê re heye. Paş vaksîne kirina pê ev vaksenê têkel, di hinek mijaran rewşên wek şokê û demekî ligel bêbersivî û nekarîna endama diqewimê, lê bilez û bê bandorên demdirêj têk diçin.

### **Rabêja gel bijîşkê vaksîne kirinê yê taybet bi bandorên kêlekî yê gengaz**

Xênjî ev belavokê, Dikarin gel bijîşkê xwe bicivin.

Lê belê dema paş vaksîne kirinê, hin nîşan derkevin holê ku zêdetir be ji bandorên sivik û giştî yê demekî ku di serî da hatin binav kirin, bijîşkê vaksîne kirinê bo pêşkêş kirina rabêjê berdestê we ye.

Bi rêyên jêr hûn dikarin serdana bijîşkê vaksîne kirinê biken:

### **Xwebêrîkirin**

Wergera orîgînal ya belavokê ronîkirinê (dem: 11/2014) bidilxweşî digel destûrana komela xaça kesk ya elmanî ji Peymangeha-Robert-Koch. Bi giştî deqê elmanî neberpîrsê wan şaşiyên ku belkî di wegerê de erbikevin û nikare wê berpîrsiyariyê bi xwe bigire, her weha ji bo nûkirina wî tekstê hatî wergerandin, eger hat bi demê re tekstê elmanî yê jêder guherankarî lê bihên kirin.

Nav Name \_\_\_\_\_

**Vaksîne kirina dijî guhreqî, duşaxe, xeneqîtik, Înfluenza Haemofilûs -Tîpe b (Hib), feleca zarrokan û zerika B***Schutzimpfung gegen Wundstarrkrampf, Diphtherie, Keuchhusten, Haemophilus-infl.-Typ-b-Erkrankungen (Hib), Kinderlähmung und Hepatitis B*

Belavoka agahîyan liser şeweyên vaksîne kirina dij bi guhreqî, duşaxe, xeneqîtik, Înfluenza Haemofilûs, Feleca zarrokan û zerika B hatine pêvek kirin. Di ev belavokê da agahîyên pêwîst liser nexweşîyên ku pê vaksîne kirinê tê bergirî kirin, vaksen, vaksîne, bandora dij bi vaksena û bandorên gengazî hatine şirove kirin. Pêş vaksîne kirinê agahîyên taybet yê jêr daxwaza biken:

*Anliegend erhalten Sie ein Merkblatt über die Durchführung der Schutzimpfung gegen Wundstarrkrampf, Diphtherie, Keuchhusten, Hib-Erkrankungen, Kinderlähmung und Hepatitis B. Darin sind die wesentlichen Angaben über die durch die Impfung vermeidbaren Krankheiten, den Impfstoff, die Impfung sowie über Impfreaktionen und mögliche Impfkomplicationen enthalten.*

Pêş vaksîne kirinê agahîyên taybet yê jêr daxwaza biken:

*Vor Durchführung der Impfung wird zusätzlich um folgende Angaben gebeten:*

1. Niha kesê ku tê vaksîne kirin saxleme?

*Ist der Impfling gegenwärtig gesund?*

Erê (Ja)

Na (Nein)

2. Kesê tê vaksîne kirin tûşî nexweşîya rêzika demarî yan alozîya damara bûye?

*Hat der Impfling eine Erkrankung des Nervensystems durchgemacht oder besteht ein Krampfleiden?*

Erê (Ja)

Na (Nein)

3. Kesê tê vaksîne kirin, alerjîyê heye?

*Ist bei dem Impfling eine Allergie bekannt?*

Erê (Ja)

Na (Nein)

Eger weye, kîjan *wenn ja, welche?* \_\_\_\_\_

4. Kesê tê vaksîne kirin tûşî bertekên alerjîk, germîya bilind, û yan bertekên na asayî yê dî, paş vaksîne kirinê berê, bûye?

*Traten bei dem Impfling nach einer früheren Impfung allergische Erscheinungen, hohes Fieber oder andere ungewöhnliche Reaktionen auf?*

Erê (Ja)

Na (Nein)

Eger hûn dixwazin liser vaksîne kirina dijî guhreqî, duşaxe, xeneqîtik, Înfluenza Haemofilûs, feleca zarrokan û zerika B agahîyên bêtir bidest bêxin ji bijîşkê vaksîne kirina xwe bipirsin!

*Falls Sie noch mehr über die Schutzimpfung gegen Wundstarrkrampf, Diphtherie, Keuchhusten, Hib-Erkrankungen, Kinderlähmung und Hepatitis B wissen wollen, fragen Sie den Impfarzt!*

Kerema xwe passporta vaksîne kirina xwe bînine ser dema hevdiîna vaksîne kirina xwe!

*Zum Impftermin bringen Sie bitte das Impfbuch mit!*

**Rezamendîya ser***Einverständniserklärung***vaksîne kirina dijî guhreqî, duşaxe, xeneqîtik, Înfluenza Haemofilûs, feleca zarr\okan û zerika B***zur Durchführung der Schutzimpfung gegen Wundstarrkrampf, Diphtherie, Keuchhusten, Hib-Erkrankungen, Kinderlähmung und Hepatitis B*

(Formên karbon jî berdestê nexweşan yan serpereştê wanin daku ligor zagona mafê nexweşan rûnivîsek ji vê verbigirin.)

*(Es stehen auch Formulare mit Durchschlag zur Verfügung, um den Impfungen bzw. ihren Sorgeberechtigten gemäß Patientenrechtegesetz eine Kopie mitgeben zu können.)*

Navê kesê tê vaksîne kirin \_\_\_\_\_

*Name des Impflings*

Rojbûn \_\_\_\_\_

*geb. am*

Min agahîyê ev belavokê xwandine û bijîşkê min agahîyên taybet bi vaksîne kirinê li civînekê da bi hûrî ji min re şirove kirine.

*Ich habe den Inhalt des Merkblatts zur Kenntnis genommen und bin von meinem Arzt/meiner Ärztin im Gespräch ausführlich über die Impfung aufgeklärt worden.*

Pirsek min ya dî tune.

*Ich habe keine weiteren Fragen.*

Rezamendîya min heye ser vaksîne kirina dijî guhreqî, duşaxe, xeneqîtik, Înfluenza Haemofilûs tîpa b, feleca zarrokan û zerika B.

*Ich willige in die vorgeschlagene Impfung gegen Wundstarrkrampf, Diphtherie, Keuchhusten, Haemophilus-influenzae-Typ-b-Erkrankungen, Kinderlähmung und Hepatitis B ein.*

Rezamendîya min ser vaksîne kirinê tune. Kêşeyê gengazî yê qebûl nekirina ev vaksîne kirinê ji min re hatine ragehandin.

*Ich lehne die Impfung ab. Über mögliche Nachteile der Ablehnung dieser Impfung wurde ich informiert.*

Nêrîn: Vermerke \_\_\_\_\_

Cî û roj: Ort, Datum \_\_\_\_\_

Îmzaya kesê vaksîne kirî û  
serpereştê wî yê zagonî

*Unterschrift des Impflings bzw. des Sorgeberechtigten*

Îmzaya bijîşk

*Unterschrift des Arztes/der Ärztin*